FESTÎVALA MÛZÎK Û STRANÊ LI HEWLÊRÊ

Bi amedebûna nûnerê serokê hikumeta Kurdistanê berêz Serbaz Hewramî û berpirsê leqê 2 û herdu wezîrên rewşenbîrî û çandinê û parêzgarê Hewlêrê û hejmareka berçav ji hunermend û hunerdostan, duyemîn festîvala Kurdistanê bo mûzîk û stranê dest pê kir.

Di rê û resmên festîvalê de ku li dawiya vê mihê hatibû li darxistin û pênç rojan vekêşa û çend gotar tê da hatine xwendin û hemûyan jî, rolê hunerî û hunermendan bi giringî nerxand ku, kargerî û kartêkirina xwe li ser nasandina doza rewaya gelê kurd û keltur û şaristaniya wê heye. Her wesa amaje pê hate kirin ku huner fakterê nasandina kesayetiya rewşenbîriya her miletekî ye û di gotara hikumeta herêma Kurdistanê de, amaje hate kirin ku hikumet berdewam bi riya wezareta rewşenbîrî, palpişt û harîkar e ji bo pêşvebirina karên hunerî. Di pirogramê festîvalê de, hunermendan Ereb Usman, Hozan Derwîş, Xelîl Wendî, Zekeriya Ebdela û çendîn hunermendên din, di vê festîvalê de pişikdarbûn ku ji seranserî Kurdistanê bûn.

WEZARETA REWŞENBÎRÎ

FESTÎVALA RÊZGIRTINÊ JI BO DÎROKNIVÎS Û ROJNAMEVANÊ KURD HUZNÎ MUKIRYANÎ SAZ KIR

Roja 8/11/2005 wezareta rewşenbîrî li bajarê Rewandizê, rê û resmên rêzgirtina dîroknivîs û rojnamevanê gelê kurd, nemir Hisên Huznî Mukriyanî saz kir.

Hejmareke mezin ji nivîskar û berpirsên deverê tê de peşdar bûn. Li demjimêr 11 siharê, perde ji ser peykerê Hiznî Mukriyanî, ji aliyê Dr. Kurdistan Mukriyanî û Fewziye xan –xêzana şehîd Ebdirehman- ve li Rewandizê hate rakirin.

Paşê wezîrê rewşenbîrî Samî Şoreş, gotarek xwend û tê de behsê xebat, tekoşîn û anîna yekem çapxaneya kurdî ya Hiznî Mukriyanî kir.

Her wesa çendîn simînar ji aliyê hindek nivîseran ve hatine pêşkêşkirin.

FESTÎVALA GELAWÊJ LI SILÊMANIYÊ

Rapor: Salihê Salihî

Bingehê Ronakbîrî Gelawêj, li bajarê Silêmaniyê, nehemîn festîvala xwe ya rewşenbîrî bi dirûşmê (Silêmanî jiwanî hogiranî peyvî azad e) li darxist. Di vê festîvalê de, çendîn rewşenbîrên kurd ji hemû perçên Kurdistanê pişikdar bûbûn, zêdebarî rewşenbîrên ereb, faris û kurd yên henderan.

Li destpêkê peyvên cudacuda hatin xwendin û giringiyek taybet bi nameya nivîskarê kurd yê cîhanî, Mehmûdê Dewletabadî hate dan, ku ji layê nivîserê mezinê Îranî Seyd Salih ve hate xwendin, ku tê da daxwaza lêborînê ji festîvalê kiribû, çinku neşiyabû amede bibe, ji ber çend bizavên rewşenbîrî li Îranê. Dîsan ji bajêrê Duhokê şandeke rewşenbîrî pişikdarî, bi helbest, çîrok û vekolînan di festîvala de kirin.

Li darxistina festîvalan, zemîneka baş bo alogorkirina hizir û endîşên core cor bo pêşvebirina edeb û rewşenbîriya kurdî. Dîsan pişikdarî rewşenbîrên erebî û faris jî, di vê festîvalê de giringeyeka xwe heye bo pitir aşnabûna li ser ferheng û edebê hev û du.

Di vê festîvalê de, pîşangeheka pirtûkan hate nîşan dan. Her wesa mêvanên wê, seredana bajêrê Helebca Şehîd û sera gorên qurbaniyên wê dan û li dawiya festîvalê xelat li ser pişikdaran hate belav kirin.